


# MULTİKULTİ KURDİ cavres



## “Koça Dawîn”

Piştî çûyîna te, em li  
hev civiyan û fikirin.  
Divê me çend name ji te  
re bişanda. Lê çawa, bi  
çi awayî? Belê bi  
dehhezaran kes, hatibûn  
cinazê te. Yêñ hatibûn  
tev, dost û hevalên te  
bûn. Gelek dost û  
hevalên te ji hebûn ku  
nikaribûn bihatina. Em,  
yêñ bi ber hewarê ve  
hatibûn, me xwest ku  
em nameyên xwe bigi-  
hijin rûhê te.

Ev hejmara taybet, di  
bin berpirsyariya Selim  
Temo hat amade kîrin.  
Dost û hevalên te nivîsar  
şandin, Roşan Lezgîn û  
Şeyhîmus Diken wêneyên  
ku kişandibûn şandin. Ya  
watedar ew bu ku ev  
nameyên han bi Kurdi  
bûna. Peyre Feqiyê  
Teyran, xwe li ser gopalê  
xwe xwar kir û helbestek  
ji te re şihad. Niha divê  
hûn li cem hev bin.

Di romana *Siya Evinê*  
de navê du beşa, “Li Ser  
Riya Koça Dawîn” e;  
beşa yekem û ya dawîn.  
Ü roman bi awayî  
xilas dice:

“Bi dù xire xirê re ji  
bêdengiya ebedî. Ne  
nafes, ne deng, ne pevv,  
ne pejn û ne ji his. Perda  
bêdengiyê bi ser her tiştî  
de tê kişandin. Her tişt  
wekî xewneke şevê, ji  
nişka ve, winda dibe. Bi  
tenê bêdengiya ebedî  
dimîne.

Bi tenê bêdengiya  
ebedî.”

Di dilê me de ji,  
dengê te yê nermik û  
sivik dimünê kekê  
Mehmed. Tu dê her di  
dilê me de biji.

CAVRES

Hejmar (Sayı): 1 - Sal (Yıl): 1

[www.kovaracavres.com](http://www.kovaracavres.com)

[info@kovaracavres.com](mailto:info@kovaracavres.com)

# Xalê Mihemed wextê tu çûyi



Wêne: Reis Çelik

## FERZENDE KAYA

### Xalê Mihemed wextê tu çûyi

Mem bi Dîclê re dipêyîve  
Naçarı ji heysete diçû dûr  
Hemderî dîlû digel şetê kûr  
Kî: Ey şîhetê eşkê min rewane

Ehmedê Xanî

### Xalê Mihemed wextê tu çûyi

Dest û payan ji berê zêde bikû, dê te bikim  
Mislê hemmadê Ereb, herwekî sêx anî bi ser  
Ehmed im, sîne sîper pêşberî tîra felekê  
De'wedarê te me, iro tu ji dehlê were der!

Melayê Cizîf

### Xalê Mihemed wextê tu çûyi

Tenê roja dilê min çûye ava  
Li ber çavên me dinya tarî ye iro  
Bihar e dil niha zer bûye xanîm  
Ne ew çax û Bihar û war e iro

Cegerxwîn

### Xalê Mihemed wextê tu çûyi

Kanî Derwêş, ka Herekol, ka Kepir?  
Ka zozanên bavê -Têli ka kê bir?  
Dibêjin ko Burca - Belek hilweşî?  
Text û bextê Botiyan de ka gesî

Celadet Ali Bedirxan

### Xalê Mihemed wextê tu çûyi

Ben  
senden önce ölmek isterim.  
Gidenin arkasından gelen  
gideni bulacak mu zannediyorsun?

Nazım Hikmet

### Xalê Mihemed wextê tu çûyi

Tutma gözyaşlarını  
Onur da ağlar...  
Bırak yıkansın gökyüzü,  
Lacivert, yeşil, altın  
Işıkları günbatımın.

Ahmed Arif

### Xalê Mihemed wextê tu çûyi

Ben kibrîti çaktığım zaman  
Hersey kırmızıydı yüzün olarak  
Ben kibrîti çaktığım zaman  
Cemal Süreya

### Xalê Mihemed wextê tu çûyi

“Ne şeymiş bu, bu dünyadan ayrılmak  
Demir tarar gibisin bigün  
Gözlerin arkalarında deryaya açılmak?”  
Hadi bre gide gide dönmüşlüğüm  
İyadesiz iyadeli tahütlüğüm  
Seni bilem gide koydum, gidi ölüm!  
Can Yücel

Xwendî 0 Mudurê Berpirsyar (İmtiyaz Sahibi ve Sorumlu Müdür): M. Zahir Sarıtaş  
Editorâr hejmara Koça Dawîn (Koça Dawîn sayısının editörü): Selim Temo

Wêneyên ve hejmare (Bu sayının fotoğrafları): Roşan Lezgîn, Şeyhîmus Diken.

Lijneya Weşanê ya Çavres (Çavres Yayın Kurulu): Fırat Cewerî, Selim Temo, Salih Kevirbirî, Kawa Nemîr  
ÇAVRES, pîveka kovara MultiKültîyî yet (ÇAVRES, MultiKulti Dergisi'nin ekidir.)

# Dê şer biqedede, dê Mehmed bi dilrehetî razê

**YAŞAR KEMAL**

E v yekem car e ku girseye-ke wisa mezin tê cinazê wêjewanekî. Hûn hemû sax bin. Mehmed her tiştê min bû. Ev zilam, zilamekî mezin bû. Bo Mehmed dê pirtük bêñ nivîsandin, dastan û helbest bêñ nivîsandin. Dî nav van dijwariyan de nivîsandina şaheseran pêk anî. Dê Mehmed bibe bîbîka çavê geleki. Ez bi vê bawer im.

Mehmed, hosteyekê ku romanâ Kurdî ya nûjen afirandî ye. Roman ci ye, roman şaristânî ye. Romanâ Kurdî ya me Mehmed afirand. Ez bi eslê xwe Kurd im, lê ne nivîskarê Kurdî me. Mehmed nivîskarekî Kurdî ye. Karê xwe ji her kesî bêtir bir rêk û pêk anî cih. Riya romana Kurdî ya bi strîn vekir. Ev yek, ji çandê re tevînekeke mezin e.

Bi sedan salan bela hatin serê dastanê ku ji ser zimanê dengbêjan kêm nebûne û helbesten Kurdan ku delaliya wan bêhempa ye. Dema ber bi windabûn ve diçûn, ha ji we re romanâ Kurdî ya dema me ku afînîrê wê Mehmed e. Ev romanê Tirkîye ne ji. Romanê Mehmed bo gelek zimanê dinê hatine wergerandin. Ew ê bi hewqasî ji nemîne. Ew ê ev roman bibin klasik, bibin mîrata mirovatiyê. Serpêhatiya romanê ya Mehmed Uzun, dirêj e, têr û tije ye. Kêm mirov vê yekê dijin.

Li herêma ku Mehmed lê ji-daybûye de, hema bêje her kes bi Kurdî dipeyiye. Wêjeya Kurdî ya nivîskî, wêjeya gel li vê herêmê ber girtiye. Zimanê Kurdî zimanekî pirr dewlemend e û helbestvanên mîna Melayê Cizîri gihandiye. Di ser de, dastan, çirok, gerandin û stranê Kurdî li vir têñ xwendin. Mehmet li axa herî kevn ya çandê jidaybûye, zimanê wî yê zikmaki bûye Kurdî, ew zimanê

Zimanê Mehmed zimanekî hosteyî û nû yê romanê ye. Ev zimanê fesîh mîna sêhrê li mirov dike, mirov di nav vê sêhrê de dimîne.



Anatoliyê ku pirr dewlemend e. Mehmed bi qasî zimanê xwe hînê Tirkî ji bûye. Zimanê Tirkî yê gel ji pirr dewlemend e. Dede Korkut, dastanen Körôglu, helbestvanen mîna Yunus Emre û Karacaoglan gihandiye. Mehmed Uzun xwe baş hînê zimanê devkî û nivîskî yê van her du gelan ji kiriye, herduya ji xwe re kiriye çavkanî.

Dema min romanen Mehmed Uzun xwendin, gelek matmayî mam. Yekem romana zimanekî çawa wisa bi hostayî, bi zimanekî dewlemend û pêşketî hatibû nivîsandin.

Béguman di qabiliyeta Mehmed Uzun de para vê çanda berfireh heye. Bi ziman û wêjeya Kurdî baş zane. Peyre berê xwe da dinê. Ji çand û wêjeya dinê sûd wergirt. Mehmed, bi vî awayî bo zimanê Kurdî dibe dîrokek. Zimanê Mehmed zimanekî hosteyî û nû yê romanê ye. Ev zimanê fesîh mîna sêhrê li mirov dike, mirov di nav vê sêhrê de dimîne. Wisa fesîh nivîsandin, karê hosteyan e. Teswîrên wî, bêyî mirov pê bihesine, bi zimanê dastanan hatiye honandin. Di taswîrên xwe de gîhiştiye şêweyên nû yê xwezayê. Xwezaya romanen wî, mîna dastanen mezin sivik û dewlemend e. Romanen wisa ku bi zimanê Kurdî, yanê zimanê herî kevn yê Mezopotam-yayê hatiye nivîsandin, bo geleki kêfxweşî û şadî ye.

Wî, kevirê bingeha zimanê romanê yê Kurdî daniye. Ev rûmet ya wî ye. Di vê demê de afîrandina zimanekî nû yê ro-

manê, karekî hêsan nîne. Mehmed Uzun, ji bin vî karê giran, bi eniya hildayı derketiye. Pişti vê destpêka bişeml, dê di zimanê herî kevn û dewlemend yê Mezopotamya de romanen mezin derkevin holê.

Tiştê ku mirovahiyê li mirovatiyê dike, berî her tiştî çand e. Di dinê de çu çand zirarê nadê çanda din. Her çand, ya din di-vejîne. Kes ji vê yekê seh nake. Çand hevûdu nakujin. Çand hevûdu zêde dikin, divejinin, dewlemendtir dikin. Yêni bi vê nizanîn, çanda xwe dikujin. Çanda ku qedexe dikin ji dikujin. Ev bela cahiltiyê ye. Di welatekî de curbicuriya çandan, dewlemendi û mezintayıya wî welatî ye. Ya ku jê seh nakin, fehm nakin ev e. Roman û kesayetiye Mehmed, dewlemendiya mirovatiyê ye. Ev mirov kip li ser piyan maye. Her car li diji ser derketiye. Di hemî jîjiana xwe de, bi gotin û berhemîn xwe li diji ser derketiye.

Çi dibe bila bibe, ki dijberî bike bila bike, dê Tirkîye bigihîje aşitiyê. Ez ji ji vê yekê bawer im. Dê di demeke nêz de, ev ser bi aşitiyê bi dawî bibe. Dê Mehmed di gora xwe de bi dilreheti razê. Bo berdewama ser, tu sedem nînin. Ji wan kiri ku ev ser, leyistek e. Tu kes nikare sedemekî bibîne. Dê yêni ku şer dixwazin bela xwe bibînin, ne gelên me.

**Wer. Selim Temo**

- Me vê gotarê, ji rojnama Radikalê wergirt (14 Cotmeh, Yekşem). Lê xuya ye ku gotar hatiye birrin. Di heman katî de wergera ku di Azadiya Welat de weşiyabû ji kêm bû.

# “Li Goristaneke Amedê”

**SELİM TEMO**

Dîroka rewşenbir û xérwxazên gel, ku bi janêñ kûr xemilibû, rahişt milén te yên bêrûh û bi ser xwe ve kişkişand. Mîna Memdûh Selim Begê ziravbihîstyâr, her wekî te nivisandibû: “Bi dû payiza jiyanê re koça dawîn” bi rê ket.

Dema nûçeya barkirina te bi hevokekî bi ser malperekê ve daweribî, êdî ne wextê rawestinê bû. Diviya ez/em bigiliştima te, min/me tu bidîta. Di germeke ku bîranînê wê bi havîneke dijwar re hebûn, li kolanêñ bajêr li trimbêlê bikirê geriyam. Piştî du satean em bi rê ketibûn. Di teyba trimbêlê de kaseta Ahmet Kaya, ya bi navê “Gururla Bakıyorum Dünyaya” hebû. Kaya û Kotan, ewên ku bi keserkûrî li dûr û dûriya welêt, di nav neçariyeke kûr de, bêwar, bêkes û bêdeng koç kiribûn, çûbûn.

Edî warêñ ku di nav xemgîneyê de zer dikirin, li pey me diman. Heta şev, mîna keserê bi ser me de hat. Min, Xwedê negiravî, dev ji çıxarê berdabû, lê tew! Eşâ te, bi tevzînokên giran ber bi dilê min ve diherikî. Min zanibû ku li çol û beyarêñ welêt, şalûr û bilbil li dor kaniyêñ simîn divenişin. Edî rûh û canê te, dê di neqeb û rêçikêñ zozanan de bifûriya.

Te heta şanik û hucreya xwe ya dawîn li ber xwe da kekê min ê delal. Lê kansér, mîna beranekî xurt, li ser mîrga canê te diçêriya. Roj bi roj, kêli bi kêli ber bi dil û canê te ve dimeşıya. Lê mîna ku tu dê hezar salî bijî, xwe ji bo vegotin û romanêñ nû amade dikir. Vêca ne yek û dido, şes heb.

Yek ji wan, meşa Mele Mistefa bû. Tu li Başur pergî yekî ku beşdarî vê meşê bûbû



hatibûn. Heta te şewe û teknika vê romanê jî ditibû. Yek ji wan, romana Melayê Cizîri û Feqîyê Teyran bû. Yek mamosta, yek şagirt. Gelo ew ê çi kelekelek ji vê têkiliyê derketina. Yek ji wan, romana Diyarbekir bû. Romana bajêrekî ku li benda pênuşekî bû. Yek ji wan, romanekê Kirmançî bû, ango Zazakî. Te zêdetir xwe dabû ser Kurmancî. Lê Kirmançî jî mîna keserekî di dilê te de mabû. Yek ji wan, “**Heviya Auerbach**” bû, ku te navên beşen romanê jî danibû. Ya şesem, romana Melayê Bateyî bû.

Dema em gîhiştin Diyarbekira şewitî, şev nîvê şevê bû, milén min diariyan, çökên min diqurifin, serê min gêj dibû. Diviya me te çawa bi çengên xwe yên germ himbezîkiribû, wisa bi kefîn desten xwe yên bêcan bi rê bikira. Di wê darbesta te ya sivik de, kul û keserên giran hebûn. Li ser milén me sivikrayî, di nav dilê me de giraniya şinê. Edî baxçeyen

Yên bo te hatibûn, yên bo xwe hatibûn!  
Ciwanêñ cavres, gündî, karmend, siyasetmedar, dost, heval û hogir, malbat... Eş û şin, ne tenê ya/yê mirî ye! Dayikêñ ku ji ser hetz piyan şin û girîn bûn ji hatibûn.  
Hema bila ji wan re cewetek hebe, ji wan malên xwe yên nîvtarî dibeziyan û bi kolanan ve diketin.

Hevselê jî li pey me man, çemê Dicleyê jî. Vêca ew ê kortejê ji ber nexwexaneya ku tu lê hêsanbûbû dest pê bikira. Ax hewar, dilêmino, gula civata lo, destmala destê xorta lo?

Yên bo te hatibûn, yên bo xwe hatibûn! Ciwanêñ cavres, gündî, karmend, siyasetmedar, dost, heval û hogir, malbat... Eş û şin, ne tenê ya/yê mirî ye! Dayikêñ ku ji ser heta piyan şin û girîn bûn ji hatibûn. Hema bila ji wan re cewetek hebe, ji wan malên xwe yên nîvtarî dibeziyan û bi kolanan ve diketin.

Tenê sê sal û nîv kekêcan, tenê sê sal û nîv, min li dergehê te ilmê te jiber kir. Sal 2004. Dema apê Yaşar Kemal, got, “**Min bangî Mehmed jî kiriye, dixwazim hûn hev nas bikin**”, êdî sur simbêlê min nedibirî. Li lobiya hotêlekî, di rojekê Gulana rengîn de, tu hatî. Porê te sipî, mîna zîv bû. Tu dibişiri. Hema kî ci bigota, tu dibişiri.

Heta, di wê hevditina dawî de ji dibişiri. Me fotografekî te yê dibistana seretayî anîbû. Kak Ekremê dostê te fotografê te danî ber te û ji heneka re got, “**Dizek ketiye mala me Mehmed, ev fotograf ji berka wî ketiye. Tu wî nas dikî?**” Tu xemgîn bûy. Em haş bûn, me nexwest rondik ji çavêñ te yên delal biherikin. Yek ji civatê, ji nav serê xwe qariya: “**Tu mezin i Mehmed Uzun!**” Te

got, "Na, ev gel mezin e!"

Em gihîstîn astgeha dawîn; serê kopekî ku berê xwe dabû çemî Dîcleyê û bedenê Diyarbekir. Dema hin kesan rondikên xwe dîbarandin, em li pey dareke hinarê ketibûn. Dara hinarê. Hinek sebir bike, ("sebûrî", ji qewlî Goranan ve), dema Adar mîna keçikeke bedew ji xewneke sar hisyar bibe, ew ê çavî û avzêm bi coşke xurt bipengizin. Ew ê dengê çemî Dîcleyê, dengê Celadet, mam Sefo, Stêr û Evdal bilind bibe. Te dengê jîbîrbûyîyan anî zîmîn. Dengê te nayê jîbîrkirin, êdi xewneresk qediyân. Va ye min helbesta dawîn ya Bateyi anî û ji te re dixwînim:

**Ji Çîrya Paşiyê Pê da**  
Ji çîrya paşiyê pê da  
Melayê Bateyê kanê  
Sefer kêşa bi Mîksê da  
Li ser weqtê zivistanê

Zivistanê evî yolê  
Evî beryê evî çolê  
Mijê avête derdolê  
Xwinavê girtî kêstanê

Xwinavê girtî nesrîne  
Cemed çebû li sewline  
Giryâ me tê ji bo asmîne  
Zerî nayênc seyranê

Zerî têñ û diyar nabin  
Coşil têñ û sitar nabin  
Çi cindî têñ siyar nabin  
Bûye tarî li kolanê

Bûye tarî û zulmate  
Sir û serma ji nû hate  
Yeqîn kanûn eda hate  
Binêrin dax û kovanê

Binêr daxa me êxsîra  
Xezam zer bûn rezê mîra  
Reyhan barî di avê da  
Reyhan barî di eywanê

Perîşan in li hingorê  
Ji Comerza gola jorê  
Mecalêd Berçela borî  
Zerî nayênc seyranê

Belê, zerî nehatin seyranê, lê hemû gel li vir e. Bi dilên xwe, bi hestîn xwe, bi rondikên xwe.

Na, tu mezin i kekê mino,  
oxir be, oxira te oxira xêrê be!

## LAL LALEŞ



## XVII-KATIB/ MU/THOTH

Te neqand kurmik ji nava herfan. Li dara dîrokê te navê çend

ferewna çep û rast nivîsi. Çerxa salnameyê şikest li ba dîroka  
darîn.

Katib bo kurm nekeve darê yarê dax bide

Katib dilê daxbûyî tu yî zimanê labûyî tu yî

Tu tu yî de ka bang li evînê bike wê li te vegere.

Çûn guher e.

Debxên yarê bi ava miriya biço. Şoya evînê kengîye?

Katib tasa ku diya min pê bi serê min dekeve di her serşuştinê de

Li sînga cêza genimê sorgul dikeve û tûrikê sofiyê dilsafî de difetise.

Mirin gewher e.

# Berxwedan Jiyan e!

## SEYHMET DİKEN

"Hevalê Eziz

Edî tu gare tune, mirin û xuyin li ber me ye  
Eger em teslim bin ji, qebena me mirin e  
Em ji li ser nya kewanê şehîda ne  
Em hevûdu hembez bikin,  
Heqê xwe ji hev ne helat bikin"

Mehmed Uzun / Destana Egideki

**E**z dibêjim qey, dema em gotina "Nivîskarek beriya mirina xwe ci dibine?" bo Mehmed Uzun, ku di 11 Cotmeh 2007an de ji nav me bar kir, bipirse, divê mirov ya herî rast bibeje: Qet nebe tiştinê ku di van sî salên dawîn de bo gelê xwe kiriye, ji ali gel ve hat pejirandin, gel lê xwedî derket; hemî tiştinê ku dîtina wan lazim bû dît, çavêwî li paş neman. Heke

mîtiakên vê mirinê ji nîn bû û ew ê di listeya kiryarê dinê de bê nivisandin. Helbet ev nesîbê şexsê Mehmed Uzun e û ji aliye edebiyata Kurdî ku rê lê vekirî ye, ve watedar e.

Heke rikin mimkûn bûya, heke riya tolhîdan û pêvçûnê hebûya, bê xîlaf, digel hêrsa kesen ku mirinê qadirê mitleq dibinin, min ê li dijberê melayiketê Ezraîl helwest bigirtina. Min ê bigotina, "Lawo, qey karê te tunebû ji xeynî rûhsitendina Mehmed Uzun?"

Ez û wî, me timikî hevûdu didit. Di hevdîtinekê de, ji min re vê gotibû, "Şeyhmet, gelê Kurd pîr bêsihûd e", peyre lê zêdekiribû: "Va tu dibînî, Yılmaz (Güney) di

Swêdî tedawiyê birrîn. Resmen dev ji min berdan û min teslimê mirinê kirin. Lî ez ê teslimê melayiketê mirinê nebim. Min bîryar da ku werim Diyarbekir." Min got, "Baş e, em ji vê yekê dixwazin, lê bela rewşa sihîta te me cisaret nekir ku em pêşniyari te bikin. Madam tu dipejîrinî, ser ser û çavan, ci pêdiyî hebin em amade ne, Diyarbekir li benda himbêzkirina te ye."

Di evara 13 Tirmeh 2006an de, hate Diyarbekir. Ji me xwestibû ku em ilama kesî pê nexin, lê ji du hezaran zêdetir kes li Firokgeha Diyarbekir civiyabûn. Hema bi peyabûna xwe re, di ambulansê de got, "Ez ne ji bo mirinê, bo jiyanê hatime vir." Bi rastî, di nêz de yan dereng, ewî ji bi dawiya nexweşinê zanibû. Lê di jûra

Kijan hogir, nas û hevalê xwe bidîtina, "Emê li ber xwe bidin, ji vê zêde çare nîn e!" digot. Lî, ji aliye din ve her kesî bo dawiya bişewat xwe amade dikir.



Mehmed Uzun, piştî nexweşinâ wî beylû bû de, beriya were Diyarbekir li Swêdê, di demeke kin şûn de bimiriya, bi ihtimaleke mezin ew ê bêyi dîtina wê xwedîderketina ku hema bêje ne nesîbê tu nivîskarı ye biçûna û ew ê çavêwî li vekirî bimana. Lî piştî di Tirmeha 2006an de hat Diyarbekir û li wê xwedîderketina mezin ku bêyi lihevkirineke politik yan rantperest bixwe bixwe çêbûbû nihêrt, çavêwî tije bûn, wiha got: "Ava xwedîderketina gel ev e!"

Îro li pey wî kî ci bibêje bila bibêje, gotina herî rast ew e ku, Diyarbekir û gelê Kurd, ya ku li Mehmed dihat kirin,

wextê xwe yê herî berhemdar de, ji nav me bar kir çû. Ahmet (Kaya), ew lawê me yê dilodîn, birûmet eşkere hat infazkirin. Û vaye ez! Di dema ku li dijî zorîyan bi ser ketim, di dema ku min romanên xwe yên herî girifing di mêjiyê xwe de pêşnûme kir, Xwedê qehra xwe lê bike, li vê nexweşinâ zalim, xedar û xayîn ya herî sawdar elqilîm. Heyf e, ev gel bi rastî ji pîr bêsihûd e".

Di sala 2006an de, ji Nisanê bigre heta Tirmehê, Mehmed li Swêdê, ez li Diyarbekir, em gelek caran bi telefunê peyivîn. Dawîyê de, di serê meha Tirmehê de li min geriya û got: "Tewaw, dibêjin edî heta virê ye! Doktorê

nexweşanê de, her car li qada Dağkapiyê, ew sûrênu ku ji dema Romayê mabûn temaş dikir û ev gotina ku gelek jê hez dikir li himber diwarê nivîna xwe daleqandibû û her car dianî zimên: "Berxwedan Jiyan e!"

Heta çû ser dilovaniya xwe berxwedêri, bîryardarî û hêviya xwe ya ji jiyanê qet winda nekir. Kijan hogir, nas û hevalê xwe bidîtina, "Em ê di ber xwe bidin, ji vê zêde çare nîn e!" digot. Lî, ji aliye din ve her kesî bo dawiya bişewat amade dikir. "Evqas bes e", digot, "ma em ê li dinê sing bikutin! Gelek incax hewqas kare li mirovekî xwe xwedî derkeve. Min viya bi çavêwî



**xwe dît, besî min e!** Pêrgî kî bihatina, digot: "Diyarbekir, kanîya şifayê ya Mezopotamya Jorîn e, mîna hûn dibînin, bû şifa min ji."

Hevdîtina me ya dawîn, bi ceweta kovara *Mesele* ku ji alî Osman Akînhay ve hatibû şihadîn çêbû. Min rahişt taximê kovarê, tevî pirtûkên ku ji alî Weşanên Nûbihar ve hatibûn çapkirin, rabûm û çûm mala wî. Ez û Lal Laleş, em cûn jûra wî ya ku bîhna xwe lê berdida. Me qederekî suhbet kir. CD ya Xaçaturyan li ser bû, mî lê gohdarî kir. Got, "Dema min *Bîra Qederê* dinivisand, min her car li Xaçaturyan gohdatî dikir."

Peyre got: "*Kürt Şiiri Antolojisi* ya Selîm Temo ku di nav weşanên Agora de derketîye, karekî gelek mikemmel e. Jê pê ve, *Mor Mührüler* ku ji alîyê Weşanên Lîs ve hatine çapkirin û çîrokîn pênc nivîskarên Tirk yên jin (Oya Baydar, Leyla Erbil, Sema Kaygusuz, Jaklin Çelik û Müge İplikçi) bi du zimanî pêşkeş dike ji pirtûkeke gelek baş e. Ez bi karên wisa kîfxwêş dibim, divê dema ez ji vê nexweşîne xilas bûm, bo her yekî nivîsek binivîsim."

Peyre em rabûn, derketin. Du roj sün de ji Mehmed çû.

Di van rojên dawî de, dema ez *Bir Romanın Hatıra Defteri* dixwînim, dibînim ku di vê pirtûkê de gelek caran hevoka "ez piirr westiyam" û gotinîn mîna vê bi kar tîne. Tu dibê qey xwê bo mirinê

amade dike. Jixwe di romanên xwe de bi şeweyen cihê gelek caran qala mirinê dike, dibe ku ew hazirîyen mirinê bin.

Niha ez têdigîhêm ku du tiştan gelek bi awayekî mikemmel amade kiriye: Min ya pêşî di saxiya wî de jê re gotibû. Di Tîrmeha 2006an de, li *banokeyê* nexweşxaneya ku lê dima de, "*Dîwana Siyasetê*" hatibû li dar xistin. Hemî tevgerên nû û kevn, yên xwedî alîkar yan yê bê xwedî alîkar, mîna ku tu hisabê wan bi hev re tunebe, wan ser û pêvçûnên xwe jîbir kiribûn û li kafeya nexweşxanê li dor heman maseyê rûniştibûn, bi xwingermî li hevîdu dînihîrtin û "*li ser Mehmed*" dipeyivin. Mehmed Uzun hatibû Diyarbekir û tu dibê qey hemî Kurdan li hevîdu anîbû. Ew aşitiya nav Kurdan ku gelek pêdiviya gelê Kurd pê hebû, bi saye û ceweta wî ava dibû. Dema min vê yekê jê re got, wisa pê kîfxwêş bû ku mirov nikare bi peyyû û hevokan bîne zîmîn.

Divê ji bo li xwe mikûr hatineke şexsî re destûr hebe. Piştî Mehmed vege riya Diyarbekir, min zêdetir nêziktayî ber bi Kurdi ve da. Diviya édi zêdetir bi Kurdi bipeyivíma, min vê kîmasiyê di rûh û canê xwe de zêdetir hest dikir. Ev yek ji, bi hatina Mehmed Uzun di jiyana min de guhartinek bû û min ji Mehmed re ji behsa vê yekê kiribû.

Di wan rojêن ku piçek be ji

bi xwe ve dihat de, rojekê hat bîra min ku, dema li Swêde bû û bi dawiya nexweşînê hesiyabû, qala wesjeta xwe kir. Hingê gotibû, "Dema ez mirim, dixwazim ku sê kes li ber serê min bipeyivin; Yaşar Kemal, Ahmet Türk û Şerafettin Elçi." Ez di wan rojan de zêde li serê nesekinim. Lî bi mirina wî re bi vê kîtekîtê hesiyam ku, bi çûyîna xwe re ji mesajekê watedar dabû. Diviya Kurdan cûdayîtiyên nav xwe bidana aliyeikî. Ev yek ji, haziriya wî ya duyem bû.

Gotineke Kurdan ya bi nav û deng heye, dibêjin: "Ga dimre çerm dimine, mîr dimre nav dimine." Belê, wêjevanekî egit diçû û li pey wî ji dinê re navek û wêjeyeka nûjen dima. Tu dibê qey, alimekî wateya karê wî ji me re digot: "Hûn xwe nas kin, hûn xwe nas." Û dumayika vê, ji alî dehhezarân kes ve dihat dabeşkirin: "Cangorî û hemnişin, qelemsor û ronakbîrê nemir Mehemed di dilê me da ye".

Gelê Kurd ê wefakar û cefakar, mîna zanibe ku ew di çi rojên zor de meşiyaye û derbas bûye, wî hilanî ser milên xwe û veşart. Dema Mehmed çû, ew nivîskar û rewşenbirên Tirk, ku her car digot "*li bal min in*", ne li wir bûn. Ji xeynî yek didoyan ne li wir bûn. Gel wî di rîwindiya wî ya dawîn de wî bi rî kir. Mehmed bi ijdan û rûhekî hêsan çû. Mîna deshpêkirina pirtûkeke ku heta niha nehatîye nivîsandin. Hêvidar im û dixwazim ku ciwanên Kurd bi berhemên edebî yên mikemeltir şûna wî tije bikin, da ku Mehmed ji, di warê xwe yê nû, ku li çemê Dicleyê, li "*On Gözülü Köprü*" ya 1500 salî, li Çiyayê Kırklar, li Geliyê Ben û Sen û li Baxçeyen Hevselê dînihîre de, li bin siya dara hinarê ku ji Qetîneya gundê wî hatîye de, di nav dilrehetiye de razê...

Wer. Selîm Temo



## ŞENER ÖZMEN

Dawîya meha Kewçêrê, Diyarbekir 2007

**E**z Kurd im, ji Tirkîyê me. Ji Swêdê me. Skandînâv im, gerdûnî me... Bi sê zimanan dînîvîsim û nîvisarên ku bi zimanên din hatine nîvisandin, dîxwînim. Romanên xwe bes bi Kurdi dînîvîsim, ceribandinê xwe bi Kurdi û bi Tirkî, qurtegotarên xwe ji bi Kurdi, bi Tirkî û bi Swêdî..." Ji pirsa yekem i Jean Claude Hussais re weha bersiv dide nîviskarekî gewre di hevpeyvînekî de. Û di hevpeyvîneka ditir de ji -ya bi Ronî Alasor re-, helwîsta xwe ya rewşenbirî -ku misoger ji kevneşopa (yan ji tecrubeya) humanîzmî têt-, bi mînakeka bibandor nîşan dide: "Di dema desthilatdariya Todor Jîkovê diktator de, di gel ku ez di rîveberiya Yekîtiya Nîviskarêni Swêdê de bûm ji, ez li dijî cihêditîn û zordestiya ku li hember Tirkê Bulxarıstanê dihate meşandin, derketim. Ez li gel rewşenbirî û nîviskarêni Bulxar xebitîm, da ku Tirk mafêni xwe yêni mirovi û azadiyê bidest'xin." Belê, mirovperwerê Kurd Mehmed Uzun 11'e Kewçêrê li Amedê, Ameda ku Uzun ji xwe re kiribû wargeh, Ameda ku Amediyan ji wî re kiribû jîngeh, Ameda ku kahniya jîn û vejinê; "kahniya heyata insan, zayîn; kahniya evîn û evîndariyê, zelaliya zaroktiyê, westa kalbûnê, kîf û henekê, best û coşê, şeng û songê,

Mehmed Uzun  
"çalakiya nîvisandinê"  
wek erkeke (wacibeke)  
etik dîtiye, ew gelê  
ku bi sedan sal di  
bin zordestiyê de  
maye (û hê ji wîsa ye)  
û zimanê jîbirbûyi ya  
wî gelê ku bi sedan  
sal pûte pê nehatiye  
kirin, rîmet û hêjahiya  
wî ya mîjûyi bi  
dirêjahiya asîmîlasyonê  
hatîye şikestin, kirêtkirin,  
dewixandin...

xebat û lebatê, ser û pevçûnê,  
kîn û nefretê û mirin û  
kuştinê..." (Hawara Dîcleyê)  
çû ser dilovaniya xwe. Li gel  
pirseka hinavşot çû: "Cîma  
însanên der û dorêni Fîrat û  
Dîcleyê, tevî ku ew bindest in,  
evçend li dijî hev in, evçend  
gora hev vedidin?" Bi besdariya  
hezaran Kurd, bi cepik û  
tililiyan çû. Wesiyyeta xwe, bi  
devê Biroyê Dengbêj anî zîmîn  
û paşê çû: "Wesiyyeta min li we,  
gava dengê min hate birîn, ne  
bi tenê dengê ava Dîcleyê, divê  
dengê dengbêjîn nûgihiştî ji  
bistre, dengê pîrejinan  
binchîwîne, dengê kalmîran  
bibêje." (HD)

Ji bili ewçend romanê  
dengvedayî, Mehmed Uzun di  
warê hunera romanê de ji  
bêşik, wek teorisyenekî bi  
pergal, hûr û kûr xebitiye. Min  
bibexşinin, min qet bawer  
nedikir ku ez dê rojekê ji  
pênuşa nîviskarekî Kurd (di  
wan rojê seqemgirti de helbet  
piraniya Kurdish wek min

## Mirina nîviskarekî rînd

difikirîn), rî û rewş, şewe û awa, teknik û zimanê hunera romana gerdûnî bixwînim û ezê ji wan şirove û vegotinêni xwerû sîd bigrim. Ma pirs ji ne ev e gelo? Nebaweri, nebaweriya min, nebaweriya me. Mehmed Uzun di pirtûka xwe ya bi navê "Bir Dil Yaratmak" de taybeti li ser ji nû ve afirandina romana Kurdi (wek mîsyonek, wek helwîsteka etik, lê ne ideolojik yan ji partizanî) bi girîngî radiweste. Nexasim li ser bikaranîna zîmîn, -di vî warî de ji ne bi parastin yan ji berevaniya Kurdiya çekirî bi rengekî tundrê, zir-neteweperest (mebest ji Kurdiya çekirî ew e ku xwendevanêni Kurd ji wan berheman hîç tiştek tenegehin, Kurdiya heyî ji ji bîra bikin), sazkirina ferhenga romanê, helbijartina bêjeyan û dirûvandina (transforma) jêderên civakî (civakzaniya Mehmed Uzun), folklorî (dengbêjîn Mehmed Uzun) û dîrokî (Memdûh Selim Begê Mehmed Uzun). Ji ber ku roman, "hunera civakêni vekirî ye. Zimanê romanê, zimanê civakêni takekesbûyi ye." (M. Uzun) Ji ber ku roman, "şoreşa herî baş û gewre ye ya ku bi zimanekî têt çekirin. Ew zimanê ku xwe gehandiye romanê, şoreşka mezin lidardixe." (M.U.) Di gelek hevpeyvînê xwe de Mehmed Uzun, dema ku behs'ji romanê vedibe, bi rîkekî lehengê mitolociyê ji bi bir tîne, mîsyona xwe bi van navêni pîrgiran destek dike, wek Hekabeyê kurê Hektor, Keyê

Troja Priamos, Odysesus, lê di gel çend tembihan: "*Em di zemanê Hektor û Akillius de najin. Her tişt encax bi pîvekên xwe tê afirandin, her beşek hunerê encax di warê xwe de geş dibe.*" (M.U.) Geşbûn ji helbet, "*encax bi hilweşîna bîr û boçûnêne demokratik û ne azadîxwaz mimkun e.*" Anglo, "*terqirina ideolojîyen tundrê û totalîter, da ku bi vî awayî Kurd xwe di jîyana rewşenbîri-wêjeyî de bi pêş bixin.*" (M.U.)

"*Jîyana rewşenbîri*", ev têgeh (konsept) di kêşeyiyêن "wêjeyî-rewşenbîri" Mehmed Uzun de xwedî cihekî taybet e. Helbet wek her tiştekî ew rewş ji girêdayê siyasetê ye. Li ser vê mijarê Uzun, ji ramyaren Dibistana Frankfurtê (wek Adorno, Horkhemier, Benjamin û Marcuse) dûr nafikire û berê rexneyên xwe yekser dide jîyana çandî ya Kurdan. Di van rexneyan de Uzun, "modern e", ji ser ramana modernist dipeyive, gava ku mînak ji wêjeya cîhanê dide navê Shakespeare, Dante, Cervantes, Xanî, Puşkin, Tolstoy, Proust, Joyce, Mann, Broch, Canetti, Singer, White, Steinbeck, Hemingway û Andriçê ku ji bo ziman û wêjeyên xwe wek "kanon" hatine pejirandin, rêt dike û nivîskariya xwe ji, nivîskariyeka girêdayî angô "angaje" dibîne. Rengê vê girêdanê ji diyar dike ku ew ne girêdaneka ideolojîk e. Wek me li jor ji behs kir, Mehmed Uzun "çalakiya nivîsandinê" wek erkeke (wacibeke) etîk dîtiye, ew gelê ku bi sedan sal di bin zordestiyê de maye (û hê ji wisa ye) û zimanê jîbirbûyi ya wî gelê ku bi sedan sal pûte pê nehatiye kirin, rûmet û hêjayiya wê ya mêtjûyi bi dirêjahiya asîmîlasyonê hatiye şikestin, kîrêtkirin, dewixandin, di gel vê.

trajediya nedîtî Mehmed Uzun bêyi ku kesek, dorhêlek yan siyasetek jê re nişan bide, bi tena serê xwe (erê, bi tenê) di zindanê Amedê û pêre pêre di jîyana kambax a mişextiyê de (salên Swêdê) li hember jîbirkirinê, tevi hemû kemasî, bedbinî û nedîtinê xebateka bêhempa, dişet bibêjim ku jori-mirov daye. Di vê serboriya epîk de Mehmed Uzun, di jûrê xwe ya piçûk a xebatê de guh li dengan, dengê windabûyi, dengê berze, dengê ku hatine birrin û birinbûyi dibe; car caran bi xwediyê dengan re dipeyive, pirsek jê têt kirin, "*mesela hûn bi kê re dipeyivin?*" (Semra Somerson, Express), dibê "*Ehmedê Xanî*." Mînak ji Mem û Zinê, ji Siyabend û Xecê dide, gîringiya kevneşopa devkî, destkevtiyên civaka xwe, dewlemendiyên zimên her û her destnişan dike. Bawer im, nivîskarén biyanî ji ji bîr û boçûnê Mehmed Uzun sîd girtine û digirin. Ji ber ku ewçend hêja ne, ewçend zelal in, birûmet û giranbiha ne gotinê wî.

Îcar, bare nivîskarén heyî û yên mayî û yên nû dest pê kinî, diyar e ku piştî vê çûna bewext û bêbext girantir bû. Ne hewcye ku em tembiha li wan "*û li xwe*" kin, giş jîr û zana ne, lê divê ji bîra nekin; Uzun ne bi tenê ji layê peyy û gotin û deng û rengan ve, lê ji aliye dil û hinav ve ji pir dewlemend û comerd bû. Hezkirîyen Uzunî nefspîçûkiya wî nişan didan. Ew bi xwe ji di temamê jîyana xwe ya wêjeyî de wek şagirteki nûgeheşti, bîmeraq û biheyecan kar kiribû. Pesndayîn û peyvîn bicoş ji rexnegirên giregir re hêla bû û hind...

Wek peyya dawî, me nivîskarekî rind wenda kir, Uzun ji nêva me çû. Her wekî ku ziman aşîtiya xwe berze kir, çemê Dîcleyê dengê xwe.

## FEQIYÊ TEYRAN

### MİHACİR

Ez dengbêj im hatim vira  
Heta hebin dengê mira  
Ezê bînîvisim ser kaxeta  
Ne dicim dêra ne mizgefta

Çolê bimînim ez bêcîl  
Ezê bikim hawar û gazî  
Çiqas bimînim hêsîr û tazi  
Dil ji halê wan dilerizî

Qeder ê bê rojek diyar  
bê gotinê navê min ê jar  
Metha bidin car bi car  
Lawê bêjin bi kitêb û zar

derbas bin rojêñ xefür  
bêñ rojêñ qenc ên kibir  
Xwe re bidin ra û tevdîr  
Hêsîr nebin ber zilma mir

Gul ê rabin bihar bihar  
Mêrg ê şîn bin mîna her car  
Avêñ kaniya bizêñ zelal  
Ê tune be Feqiyê dilsar

Lê ez dicim xortêñ cahil  
Hez bikin gerek e şer bikin timê  
Hez bikin hûn ji jin zaro ahil  
Pêsiya mîra pêsiya zilmê



# Piştî Mehmed Uzun\*

KEMAL VAROL

**B**éguman pirtûka Mehmed Uzun ya ku wî di nav girseyen mezin yên xwendevanan da naskirin, *Bîra Qederê* ye. Uzun, di vê romana xwe de çiroka xizmetkarê zimanê Kurdî Celadet Ali Bedirxan, ku ji Tirkîyê heta Suriyê didomand nivîsiye. Pêşî çiroka trajik ya Bexirxaniyan ku alfabeşa Kurdî ya iro Kurd bi kar tînin amade kîribûn, kovarêne wêjeyî weşandibûn û pirtükên gramerê amade-kiribûn li pênûse xist. Ev romana wî li dora imajâ bîrê cù û hat; li dora taritiya bîrekê, li dora qedera bîrekê.. Di jiyana nivîskarî ya Mehmed Uzun de, béguman cihekî fireh yê Celadet Ali Bedirxan hebû. Him bela ku eynî aqubet hatibû serê wî ji, him ji bela ku çiroka nivîskariya wî ya bi heman aqubetê ve paralel hebû: Bo zimén xizmeteke piralî, ser de is rarek di derbarê zimanekî de ku heta wê rojê kevneşopiya wê ya nivîskî bêjiyan mabû û xwendevanên wê kêm bûn, li himber van ji ji yaneke derkeriyê ku buhayê wê giran bû.

Her nivîskarı, mîna daketina bi nêv bîrekê ve ye. Karekî ku bi taritiya wê bîrê ve, bi tirs û

xofa wê bîrê ve, lê zêdetir ji bi sêwirîna héviya dîtin û rast hatina tiştan ve girêdaye. *Bîra Qederê*, piçek ji qala vê yekê dikir: Kevneşopiya nivîskî ku tu bikî nekî dergediket holê, di civateke negîhiştî de serpêhatiya rewşenbirekê Kurd ku dixwest kevneşopiya nivîskî bivejîne. Çiroka rewşenbirekê ku dixwest avê derxîne û parve bike. Ew rewşenbirekê ku di dawîyê de jiyana wî di bîra ku hilwehiya de te-waw bû...

Mirov kare bibêje ku jiyana Mehmed Uzun ji ya hezkirîyên wî, ya Bedirxaniyan ne cuda bû. Pêşî ew sirguniya nêzî bist salî ku mirov nikare xwe li ber bigre, di vê sirgûniyê de li bendî belavbûna romanen rawestin, bi sebra rûniştina kevneşopiya romana Kurdî rawestin û di vê helwesta han de, li dûri minaqaşeyen politik yên serkî de mayin. Mehmed Uzun ne tenê li himber bêtamûliya di derbarê zimanê Kurdî de rawestiya, bi minaqaşeyen di nav Kurdan ve ji mijûl bû.

Sala par, dema kanserê li canê wî da û hat Tirkîyê, daxuya-niyek dabû ku, dilê mirov disot: "Dema min seh kir ku kanser im, qet ne heyirîm!" Belkû ev yek, ji wî nivîskarê ku jiyana wî di

Li derive baraneke gur, mîna devê cêr dibariya.

Gelek westiyabû

**Mehmed Uzun. Xwest ku nêzî şibakê bibe û piçek be ji bêhna xwe berde. Hingê min bîra di baxçê pirtûkhanê de bû û devê wê hatibû girtin şanî wî da. Eynî mîna lehengê *Bîra Qederê* ku hemû jiyana wî li dora bîran derbas bûbû...**

Zêde tiştekî negot.

nêv sirgün, bêtamûli û bêevîntiyan de derbas bûbû, lomeyeke tenik bû bo gewdê wî. Lê ew lo-me, di nêv demeke kin de bû sedemê kêfweşîyeke gelek mezin. Zimanekî ku ne xwediyê kevneşopiya romanê bû, yanê zimanê Kurdî tevî kevneşopiya devkî kir û jê azmayışeke nûjen ava kir. Mehmed Uzun, beriya mirina xwe, dît ku girseyen fireh qîmet dan vê cehda wî. Roja cinazê wî, ji gelek dorhêlan mirov li hevûdu civiyan. Di kesayetiya wî de razdarî hebû. Ez bawer im, ev nivîskarê humanist, dê bi vê yekê gelek kêfweş bûbe.

Me berî deh salan hevûdu naskir. Roja Mehmed Uzun ji sirgûniyê vege riya Diyarbekir û bi xwendevanên xwe re hevpeyvînek li dar dixist û pirtükên xwe imze dikir, ez ji li wê derê bûm. Min dixwest pê re hevpeyvînek çebikim. Min romana *Bîra Qederê* xwendibû û béguman gelek di bin bandora wê de mabûm. Min bara rojê lê temaş kiribû û bûbûm şahidê sebr, bêrikirin û dilgeşîya bist salan ya nivîskarekî. Pirtûkxane wisa qerebalix bû ku me bo hevpeyvînê tu derfet nedît. Bi saetan li benda valabûna salonê rawestiyam, lê eyb e eyb. Ew ê evarê ji Diyarbekir biçuya Stenbolê, ji wir ji biçuya Swêda ku gelek nivîskarê Kurd himbez kiribû. Hindik mabû ku firoke rabe, em derbasî jûrekê bûn, hingê min got ku em ê nikaribin hevpeyvînek çebikin, ez ê dîtinê xwe binivîsim. Li derva ba-



raneke gurr, mîna devê cêr dibariya. Gelek westiyabû Mehmed Uzun. Xwest ku nêzî şibakê bibe û piçek be ji bîhna xwe berde. Hingê min bîra di baxçê pirtûkxanê de bû û devê wê hatibû girtin şanî wî da. Eynî mîna lehengê Bîra Qederê ku hemû jiyana wî li dora bîran derbas bûbû... Zêde tiştekî negot. Fêhîm kiribû ku ez ci dibêjim. Bist sal şûn de hatibû Diyarbekir û li ber devê bîrekê bi xwendevanê xwe re peyivibû.

## BIRCAN DEĞIRMENÇİ

Xwedawo, heke perê te tunebe em bidin  
Ji xwe re saet bistine  
Wisa bêwext hezkiriyên me nebe

**M**irin... Tu çiqas giranî, ne gewdê me karê te hilgire, ne dilê me. Dema tu têy, çawa her tişti radiwestinî, me di nêv bêdengiyê didewisînî. Hemî rê û rîzan ser û bin dikî, qeweta me tune em li dijî te li berxwe bidin. Kijan silah kare te bikuje? Hemî wate yeko-ye kî wînî de bîrîmînî godarî dikim. Seyda, mizgina hesanbuna Uzun dida, ew ê ji nexweşnaxê derketa. Bo niha be ji li dijî eşikê serfraz bûbû. Diyarbekir wî himbezîkiri- bû, bi rûhê xwe yê berxwedêr bo wî bûbû mortal, li hember wê nexweşna ku mirov nikarê navê wê bilîv bîke, yek û sıfir ketibû pêş. Di hinava min de helecanek, di heman katî de héviyek vejiya. Di heman rojan de diya min ji li dijî nexweşinê li ber xwe dida. Ew roja ku wî anîn Diyarbekir, bo min ji bûbû emsal. Gelo min diya xwe ji bianiya, ew warê ku lê jidaybûbû dê këfxweşya wê ya jiyanê zêde bikira? Çend car min xwest ku wê bînim, doktoran destûr nedan.

Saet 111an de, tevî doktoran xwe, mîna şervanekî derket hızûra me. Dr. Adem Avcıkan, digot ku ew ê tedawiya wî édi li malê bidome. Dema dora wî hat, bi hiseke mezin ya mînetê got, "Ez qurbana ve bim!" Evîna geleki bû ku wî kip li piyan dihişt. "Qeweta we min di şerî jiyan û mirinê de bitenê nehişt." Ü gotibû ku dixwaze romana Diyarbekir

Heke her nivîskarî légerîna bîrekê be, daketina wê bîrê be, rewşa nivîskarîn Kurd her car dijwartir bû: Berî her tişti diviya mîna her nivîskarî bîrekê biditîna, peyre daketina wê bîrê, lê di-dawiyê de di wê bîrê de dîtina bîreke dinê! Mehmed Uzun di jiyana nivîskariya xwe de, li bîrîn Mezopotamya ku ji zû de miçikiyabûn geriya. Bi zarafeteke mezin, bi kesayetiyeke humanîst ya seyr, bi nefsbîcûkiye-

ke ku mirov matmayî dihişt... Cîvakêñ windabûyi yêñ Mezopotamya, efsaneyen wan cîvan-kan, wan dengê windabûyi, cîrokêñ xurt yêñ dengbêjan bi wêjeya nûjen re, bi zimanek ji zimanê herî kevn yê Mezopotamya gîhand hev. Dê wî hêj ji vî karî bidomandina. Lî jiyana wî têr nekir. Bo me hemîyan bîreke ku ava wê ya xêrê ye, hişt!

**Wer. Selim Temo**

\* Ji 22. hejmara (26 Cotmeh-5 Çiriya Paşin 2007) Kitap Zamanu hatîye wergerandin.

## Wa mirin, tu bimiriyyat!

kir binivise. Nexweşxana ku di dilê Diyarbekir de bû, li Daxqapiyê. Bircû bedenên bajêr li himberê mirinê bûbûn çeper. Her roj bi sedan kes serî li wî konê ku li qadê hatibû vergirtin dixist. Di wê defterta ku bo wî hatibû dayîn, bi pénûsîn xwe bo ku pénûsa wî nekeve rîzikan dinivîsan- din. Dayikan bi duayêن xwe, dengbêjan bi stranê xwe can didan Mehmed.

Dema ez ji nexweşxanê derketim, di hinava min de këfxweşyeke bêtârif hebû. Nexwe hêvi her hebû, nexwe moral bo vê nexweşinê bi rasti ji yekeyek bû. Èré, édi biryara min misoger bû, min ê diya xwe bianiya. Lî nebû, ew xebera reş, këfxweşya başbûna Uzun di qirika min de hişt. Mirina bêbav di heman saetan de li deriyê diya min xistibû. Nîvê can û gewdê min bi xwe re biribû bin erda reş. Pelek ji pelên payîzê weşandibû. Édi roj cûbû ava, rengê bajêrê min gewr bûbû. Her tişti watuya xwe wînî de tewâw bûbû. Bazaltê Qerecdaxî ji nav dest û tiiliyên me semitibû û diçû. Rondik dibûn lehî û tevî çemî Dicleyê dibûn. Dicle bo Uzun diqarıya, sur, tu dibê qey ji heşmeta xwe gelek tiştî wînî de tewâw bûbû. Kevirên reş yêñ bajêr, li ber wî serê xwe tewandibûn. Uzunê ku ne tenê nivîskar bû, di heman katî de siyasetmedar û intelektuel bû, di we- siyeta xwe de xwestibû ku Yaşar Ke- mal, Ahmet Türk û Şerafettin Elçi di merasima cinazê wî de biaxivin. Di wê jiyana xwe ya ku bi derbiderî der- bas bûbû de, xwestibû ku Kurd di ali fikir de cihê bin ji bibin yek. Bi çûyîna xwe re xwesteke diyalogê anîbû zîmîn. Édi di welatê ku bo wê pertûkan nivîsandibû de sîrgûn nîn bû. Li alîkî Çiyâyê Kirklar, On Gözlu Köprü, li alîyê din bi sûren Diyarbekir bûbû cîranê Vedat Aydin, ket nêv xewa xwe ya ebedi.

Jiyan (dibe ku ya herî xirab ji ev be), digel hemî tişti didomiya. Ava Hamrawatê ya li wî aliye bajêr ku bûbû dest û piyên wê çinara mezin bûbû derman. Ji nû ve xwe dîghînd jîyanê. Dixebîti ku romana Diyarbekir binivise, di suhbathe heval û hogiran de bo wî gelê wefakar evîn û mîneta xwe dianî zîmîn. Deng, zîmîn û ij- danê gelê xwe bû disa. Tedawiya wî didomand di vê navberê de. Li ber wan derbêni ku li pey hev dihatin, bi taqeta xwe ya dawîn li ber xwe dida. Mirin wî nedîtîsrand, neyeta wî ew bû ku li piyan derkeve pêşîya wê.

**Wer. Selim Temo**

Di nav de salek derbas bû, dîsa rojeke Cotmehê, xebera reş bi tele- funê hat. Diyarbekir, Mehmed Uzun winda kiribû. Em hema wêga gihiştin Zankoya Tibbê. Xeber rast bû, édi tu tişt çare nedikir. Ya ku ji destê me dihat, ev bû; divê me bi merasi- meke ku li pénûs û nav û dengê wî dihat bi rê bikira. Roja ew roj hat, hemû hezkiriyên wî di nêv cil û bergên reş de, ku simbolê mirinê bû, li ber nexweşxanê bûn... Ew nivîskarî ku di hemî jiyana xwe de siyase- ta aşitîyê dişopand, bi xêliyeke spî ku rengê aşitîyê bû, pêçayı û meyîte wî di nêv külîlkan de mîna here dilanê xemilîbû. Dema wî anîn ber Mizgef- ta Mezin, gîrêk kete qirika min, mîna ku qet dernekeve. Dem rawes- tiyabû édi. Dil disotian, êş bêtârif bû. Romannîvîse hoste, bi welatê stérkan ve dihat bîrêkirin. Rola wî ya de sehneya jîyanê de tewâw bûbû. Bazaltê Qerecdaxî ji nav dest û tiiliyên me semitibû û diçû. Rondik dibûn lehî û tevî çemî Dicleyê dibûn. Dicle bo Uzun diqarıya, sur, tu dibê qey ji heşmeta xwe gelek tiştî wînî de tewâw bûbû. Kevirên reş yêñ bajêr, li ber wî serê xwe tewandibûn. Uzunê ku ne tenê nivîskar bû, di heman katî de siyasetmedar û intelektuel bû, di we- siyeta xwe de xwestibû ku Yaşar Ke- mal, Ahmet Türk û Şerafettin Elçi di merasima cinazê wî de biaxivin. Di wê jiyana xwe ya ku bi derbiderî der- bas bûbû de, xwestibû ku Kurd di ali fikir de cihê bin ji bibin yek. Bi çûyîna xwe re xwesteke diyalogê anîbû zîmîn. Édi di welatê ku bo wê pertûkan nivîsandibû de sîrgûn nîn bû. Li alîkî Çiyâyê Kirklar, On Gözlu Köprü, li alîyê din bi sûren Diyarbekir bûbû cîranê Vedat Aydin, ket nêv xewa xwe ya ebedi.

Sozekê Amedê heye bo te: "Tu bi dilreheti razê nivîskarê me. Dê murekeba te ziwa nebe, dê pénûsa te her binivise."

**Wer. Selim Temo**

# Dostanîyek e dûr û dirêj a edebî

## MUHSİN KIZILKAYA

**S**ala 1992 bû. Min li filme "Dilketi", ku naveroka wê romana Margaret Durasê hatiye avakirin, temaş kiribû û li Kolana Îstiklalê ve dimeşiyam. Du kes nêzîkî min bûn, bi nav li min kîrin. Yek ji wan Umît Fîrat bû. Yê din kesek cil û bergen xweşik, qam dirêj û hev hatî bû. Kêm qise û zidetir guhdarî dikir. Umît, me bi hev da naskirin. Ew kes Mehmed Uzun bû. Bi naskirina kesek wesan ez dilxweş bûm. Ez bawer im, ew ji bî vê yekê këfxweş bû.

Di eslê xwe de, min Mehmed Uzun nas dikir. Min hinekî xwe li hemberî wî deyndar dihesiband. Ev naskirin, bû alikar ku ev deynê xwe sivik bikim. Navê Mehmed Uzun, li Tirkîyê di salên 1970 de, mîna xortek şoresser ku nêzî Kovara Rizgarî bû, dihate nasîn. Paşê ji, bi rîvebiriya kovarê û mecbûrbûna derketina derveyî welêt û penabertî tê.

Min, heta sala 1990î, wi baş nasnedikir. Piştî zanîngehê, min li Stenbole dest bi karê rojnamevaniye kir, ez gelek caran pergi navê wî bûm. Piştî vê li ser kar û xebata wî ez hînî gelek agahîyan bûm. Belê, wî li hember hemû astengan, bi israr romanen bi kurdî dinivisi. Lî mixabin min ci romanen wî bi dest nedixist. Min bi tenê ceribandina wî a dirêj ku di kovara "Birikim" c de, di bin nave "Welatê Xerîbiyê" (Bir Hüzündür Ayrılık) hatîbû weşandin, xwendibû. Nivisa wi pir bala min kişand û min bêtir nêzîkî wî kiribû...

1991de bi destê Turgut Ozal, hinek qanûnên li pêşîya zimanê kurdî hatin guhêrtin. Bi wan guhêrtinan, her ne tene, lê pîrsa kurd, bi aliye çandî ji xwe da berê pêş û



rojeva Tirkîyê dagirkir. Ev guhêrtin, qedexekirinê li ser kar û xebatê çandî sivik kiribû. Ji ber wê yekê, rîya qisekirinê ji aliye çandî ve ji vebûbû.

Heviyek çêbûbû. Bi carekî re, ji pir aliyan tevgerek çandî xwe da der. Gava rewşek wesan çêbû, ji bo nasendinek piralî a kurda min û Halil Nebiler peşniyazek bir ji birêvebirîya rojnamê re. Peşniyaz hate pejîrandin. Me bi gelek kesan re peywendi danî û çavkaniyênu ku hene raçav kir. Nivis di bin navê "Dünden Yarına Kürtler"

hatîbû amadekirin. Di vê rezenivîsa me de, gava ku em giştin beşa romanê, min nivîs di bin sernivîsa "Romana kurdî hê nehatîye nivîsîn" de weşand. Di esle xwe, min xwest ku bi ve yekê ez romannivîskare tîrk rexne bikim ku çîma nebûne alîkarê romana kurdî. Nivîsa min şaş hat fehmikirin. Gelek xwendevanan, bi taybetî nameyeke ku ji hepsê hatîbû, ez bi nezanî gunehkar dikirim û bala min dikşand ser romanen Mehmed Uzun. Wê demê navê Mehmed Uzun li nik min bu xwedî wateyek mezin. Paşî ew rîzenivîs di gel nameya wî xwendevanî ve, mîna pirtûkekê hate çapkirin. Bi vê kirinê, min hinekî dixwest ku ez izra xwe bixwazim. Lî ev têr nedikir. Min dixwest ku ez vê nezanbûna xwe li pêşberî Mehmed Uzun ji binim zîmân. Belê, wê roja ku min û

Dostaniya me bere xwe fireh kir û bû hevaltiya edebî. Her cara ku ew ji Swêdê dihat, em bi saetan rûdiniştin û me qala edebiyatê dikir.

Mehmed Uzun hevûdu nasî, min qala vê çiroka xwe a jorî kir, lebîhûrîna xwe xwest. Wê rojê, heta derengê sevê em bi hevre man ê me suhbetek xweş kir.

Cara duwemî me hevûdu 1992de li rojnameya Ozgur Gundemê dît. Ez berpirsiyare rojnamê yê çandî bûm. Vê carê me hevûdu baştir dinası. Min pirtûka wî ya "Sîya Evînê" xendibû, wî ji baştir min naskirî bû. Piştî romana Erebê Şemo, "Şîvanê Kurd", Sîya Evînê romana duwem bû ku min bi zimanê xwe xwendibû. Jîyana Memdûh Selîm Begê bû ku pêncî salen bi xweşî û nexweşîyan derbaz kiribû, himêz dikir.

Belê dostaniya me wesan dest pê kîrî bû. Pişt re, vê dostaniyê bere xwe fireh kir û bû hevaltiya edebî. Her cara ku ew ji Swêdê dihat, em bi saetan rûdiniştin û me qala edebiyatê dikir. Peşketinê edebî, projeyen pêşerojê ji xalê suhbeten me bûn.

Mehmed Uzun, pêşketinê edebî li cihaneh ji nêz ve raçav dike. Gelek romannivîsên navdar nas dike. Ji ber vê yekê di her suhbeten me de, min ji dîtinê wî sûdêne mezin girtin. Dostaniya min û Mehmed Uzun, paşê dirêjî elaqetên nivîsar û wergervaniyê bû.

Mehmed Uzun, ne keseki bizavker e. Ev mirovê edebiyatê ye. Dî roman û ceribandinê wî de, kesek nikare peyveke agresif bibîne. Wî cihê xwe, bi çeka herî giring a edebî û bi zanebûn, di pêvajoya vejîna çanda Kurdî de hilbijartiyen...

**ABİDİN PARILTı**

**A**herî xerab ew e ku mirov mecbûr bimîne telefona heval û hogirekî, dost û birayekî ji telefona xwe reş bike. Paşê mirov mecbûr dimîne navnişana wî/wê ji ji defterê derxe. U gava ev tişt her go zêde dibin wê demê mirov pê dihese ku hema bi zû di nav sala de derbas dibe. Ew kes derkekiye ji jiyana we weke go qet çênebûbe. Berê wî/wê mirovên din ji çûbûn ji xwe. Weke we ew rojêñ xweş û şad nejiyabe. Hûn bi hevre negîhiştine tahma, "qazandîbî", we behsa kitêba nekiriye, web i hevre şarap tâhm nekiriye, ji eyîn nivîskarî heznekiriye û hûn bi vê kêfxwêş nebûne... hiş dijmin e êdi... dijmine we... Her go hûn bixwazin ji bir bikin hişê we wê eşê ji were bine... Lê disa ji mirov dizane ku herkes bi şopêñ derbasbûnê riya xwe dibîne û bi windabûnêñ xwe dijî.

\*\*\*

Ez nikarim bêjîm Mehmed Uzun wefat kir. Lê ez dikarim tenê bêjîm Uzun çû... tenê çû... Gava min bihist Mehmed

**Ez nikarim bêjîm  
Mehmed Uzun wefat  
kir. Lê ez dikarim tenê  
bêjîm Uzun çû... tenê  
çû... Gava min bihist  
Mehmed Uzun çû,  
ev gotinêñ ha di serê  
min de derbas bûn...**

Uzun çû ev gotinêñ ha di serê min de derbasbûn... Ev deh sal e me hev nasdikir lê ev çend salên dawî nezikatiya me berfireh bû... herdem rûken bu...

Gava nexweş ket ji ez neçûm serdana wî. Ji ber ku çalhvê min barnedibû ku ez wî di wî halê nexweş de bibînim... Mîna ku di rojêñ zarokatiyê de qehremanekî mirov hebe û ew qehreman têkeve halekî nexweş û hest û baweriyên mirov ji birije erdê... min ew di wî halî de bidîta ezê teketama rewşike xirab u xeyalşikestî... min nedît.

\*\*\*

**Rêwiye riya dirêj UZUN**

Lê ez û çend dostê xwe, cûn cenaza Uzun... Ez şas mam... ji bo ci ewqas insan hatibûn vê cenazê... mirov ji bo ci ji gund û bajarêñ xwe, ji malêñ xwe derketibûn û dabûn rê hatibûn cenazê... ma nivîskarek ji bo xelkekî ewqas bi qîmet bû? Ez dizanim ev pirseke mezin û zahmet e... lê pirseke girîng e û divê bê bersiv kirin... gelek kesen hatibûn xwendin û nivîsandin nizanibûn, xwiyabû kitêbêñ Uzun nexwendibûn, lê ji bo ci lê xwedî derdiketin?

A din di civata cenazê de helbet mirovên qamerahez ji hebûn... ev kes çendin navdarbûn ji bê qamera nikarîbûn bimeşîyan... qamera diçû ku rûyê wan ê şuştî ji bi hemi paqîjiya xwe li wir amade bû... Biji ji wan re ku di rojêñ ewqas xemgîn de ji bi serfirazî xwe nîşan didan...

Lê a herî bala min kişand û ez êşandim yek jê ew bû ku nivîskarêñ esiltirk ji bili çend kesan nehatibûn... lê gava Uzun li jiyanê bû ez baş dizanim ew nivîskarêñ gewre herdem li der dora wî bun...

\*\*\*

Uzun di wasîyeta xwe de xwestibû sê kes bipeyîvin. Yaşar Kemal, Ahmet Türk û Şerafettin Elçi... ev xwestekêk sembolik bû. Uzun gava çû ji dixwest kurd bibin yek û bi ronîyekê bimeşin...

Piştî cenazê dilê me şikesti, xemgîn em vegeryan... lê. Uzun li welatê xwe, di nav axa xwe de ma... êdi ne surgûn û derketî bû... li welatê xwe di nav heval û hogirê xwe de bû...

Hûn miroveki cara dawî çawa bibinin wê herdem di xewn û xeyalêñ we de di wî halê xwe de bimîne. Di xeyala min de rewîye riya dirêj Uzun wê herdem zindî u rûken bimîne...

# Yekî zêde: Mehmed Uzun

METİN KAYGALAK

**D**îvê payîza 98an be, li Îstîklalê, li şûna kevn a Pirtûkxana Medyayê, Abdullah Keskin me bi hevûdu da naskirin. Hema wê gavê em ketin suhbeteke ku ji *Bîra Qederê* ber bi bîra min ve vezeliya. Suhbeta ku li ser metafora bîrê hûr dibû, me ber bi lehengên romanên ku me xwendibû ve biribû. Ji Calvino heta Beckett, ji Capote, ji Sadiq Hidayet heta Yusuf Atılgan, min bi carekî navan jîmartibû; dibe ku romannivîs û çiroknivîsan bala wî kişandibe, bi hevokekê ketibû navbera gotinê min: "Tu helbestvan i, va bû qederek ku tu qala romannivîs û çiroknivîsan dikî." Min ji xwest ku bibêjim, ji zaroktiya min ve miraqa min li ser romanen e, bi taybeti ji ji romanen şoreshvanî pêş de ketiye, asas min her dixwest bibim romannivîs û filan, lê ewî destê xwe yê rastê mîna nermahiya pejirandinê dirêj kiribû û bi gotina hevokeke mîna "Min diwana te xwend, baş e ku te helbest nivisiye" bîra min taltîf kiribû. Ewî ji pirtûkê helbestan re digot *dîwan*. Belê, ji ber ku helbest, diwan bû. Ev yek, helwesteke Rojhîlatî bû. Piçek bi şermezari, piçek ew quretiya veşartî ya zêdehiya min i zarok hatibû di nav rûyê min de rûniştibû. Hinarokên min, bûbûn azayê şermoke yên rûmetdariya min.

Dibe ku payîza 2004an be, li Beyoxlu Oacakbaşiyê, em tevi Metîn Kahraman rûniştibûn. Em bara şevê ketibûn kûriya suhbete û mîna dardarokê ji muzikê bigre heta wêjeyê çûbûn û hatibûn. E, du Kurdên Zaza dîtibû, qet texsîr nekir û got ku diya wî Zaza ye û baş bi Zazakî zane bipeyive. Ü ew ê bi Zazakî dastanekê



Em tevi Metîn Kahraman rûniştibûn. Em bara şevê ketibûn kûriya suhbete û mîna dardarokê ji muzikê bigire heta wêjeyê çûbûn û hatibûn. E, du kurdên zaza dîtibû, qet texsîr nekir û got ku diya wî zaza ye û baş bi zazakî zane bipeyive. Ü ew ê bi zazakî dastanekê binivisiya. Ew Mehmed Uzun bû, heke bigota ez ê bikim, ew ê bikira.

binivisiya. Ew Mehmed Uzun bû, heke bigota ez ê bikim, ew ê bikira. Di dawiya şevê de me tûrekê avêt, ji serî heta binê kolana Îstîklalê, me piçek kurtepistên wêjeyê ji kir, peyre em çûn bufeyên serê kolanê û me bi vexwarina ava gizérê şevê bi dawî anî. Yek ji wan taybetmendiyen wî yê bandorker ev bû; dema mirov pergî hev dibû, dixwazî bila di nav de meh an sal derbas bûbin, bi wê bîra xwe ya metelhiştî, suhbeta berê bi kijan peyvê xelas bû be, bi heman peyvê dest pê dikir. Dema mirov pê re diket suhbete, mirov hest dikir ku digel ku li Swêdê dijiya ji, İlâhim mola wî li van deran bû -jixwe divê wisa bûya ji, ma qey em li benda tiştekî din bûn! Ew kesê ku xebatên we dişopand, camêrê wêjeyê, zilamekî delal, dilgermiya kekekî dûr ku çavên wî her car li ser mirov bû.

Dema ji Swêdê bê ser û bê çav vegeperiya, ez ji mîna dost û birayênu ku hezkiriyen wî bûn siwar bûm çûm Diyarbekir. Ez û Kemal Varol, em bi hevûdu

re çûbûn ew jûra wî ya ku li Dağ Kapiyê dinihêrt. Ew îma ku di rûyê Muhsin Kızılkaya û bû, mîna kevirekî di hinava min de rûnişt. Nexwe kekê Mehmed êdî mîvan bû. Lî bi wê biryardariya xwe ya Sêweregî bo mîvanen xwe hevokan digot: Kurdi, Mezopotamik û mîna her car dîlxweşkir...

Ji temasâ Diyarbekir ya ji Çiyayê Kirkklärê pirr hez dikir. Me niha te ji hewşa Mizgefta Mezin ya bikeser di nav wan selayên ku her car mirov diarînin ber bi Deriyê Mîrdînê ve bir. Bo temasékirina Bexçeyen Hevselê, Pira On Gözlüyê û Dîcleya ku te diparast.

Te ji dît, her kes hatibû, gel tev li wir bû; ew zilamên Perwarî, bi wan erbaneyên di destê wan de ber bi dîlana te ve dimeşîyan... Her kes yek zêde bû ew roj; piçek Memdûh Selîm Beg, piçek Biro, piçek Rewşen Xanim; piranî Mîr Celadet û dengbêjên herî delal yên umrê te...

Wer. Selîm Temo

# UZUN ROMAN


## MEHMED UZUN PORTRESİ

FERZENDE HAYA'nın  
kaleminden...

Eşi Zozan Uzun, kayınpederi ve amcası Celal Uzun, çevirmeni, bacanağı ve arkadaşı Muhsin Kızılıkaya, kardeşi Mahmut Uzun, arkadaşları Fırat Cewerî, İbrahim Güçlü, Adem Avcıkiran, Keya İzol ve doktoru Mahmut İlhan'ın tanıklıklarıyla...

A. Ömer Türkeş, Ahmet Güneştekin,  
Ahmet Öz, Ahmet Tulgar,  
Ahmet Uzun, Abidin  
Panlıtlı, Berat Günçikan,  
Canip Yıldırım, Evrim  
Alataş, Hacı Akman,  
Hasan Cemal, Hrant Dink,  
İsmail Beşikçi, Keya İzol,  
Mehmet Zahir, Melih  
Pakdemir, Taner Akçam,  
Migirdiç Margosyan, Muhamrem  
Erbey, Muhsin Kızılıkaya, Müslüm  
Yücel, Necmiye Alpay, Öncel Öziçer,  
Reis Çelik, Reyhan Çiçek, Salih Bolat,  
Sedat Yurttaş, Selim Temo, Semih  
Gümüş, Şeyhmuş Diken, Thorvald Steen,  
Yaşar Karadoğan, Yaşar Kemal, Yaşar  
Seyman, Yılmaz Erdoğan, Zeki Bulduk,  
Zülfü Livaneli'nin makaleleri ve  
Doğan Hızlan'ın önsözüyle...

Mehmed Uzun'un muhteşem  
anlatımı eşliğinde...



UZUN ROMAN  
MEHMED UZUN PORTRESİ  
FERZENDE HAYA

# Oxira te ya xêrê be Mehmed Uzun

Erê Mihemedo! Erê Birawo!  
Erê Keko!

Dostê gelê xwe. Xwediye se-rencema dirêj. Xwediye sozê xwe. İro eyd e. İro cejn e. Bila tu kes li kincen me yên reş nenêre. Bila li xemginiya me û li zîziya me nenêre. Erê Birawo ez ji kelogirî me. Lî İro eyd e. İro cejn e.

Li vê axê bi sed salan e cejnên me di nava xemginiyê de û bi dileki şikesti derbas dîbin.

İro disa cejna me, cejneke reş e...

Lî li gel zehmetiyan wê asmin berf û cemedê bîheline.

Hêviyên me fena hêviyên te ne.

Di quncikê dilê me de ji bo cejnên azad û şahiyan hêviyên me hene.

Mihemedo Birawo!

Dostno, hevalno!

Ey gelê bi me yên bi rûmet. Wê roj were, ew cwrêş reş û tarî wê belav bibin.

Hemû nivîskar ne li sîrgûnê, ne li girtigehê, ne li ber roniya çîrayê, lî li ber roniya stérkan, li ber roniya heyvî û li ber roniya rojê

wê hestêñ xwe yên azad binivisinin.

İro ji bo nêzîkirina wê rojê te em anîn cem hev.

Keda te kedekî gelek mezin e.

Li ser riya Ehmedê Xanî, Melayê Cizîri û Feqiyê Teyran tu meşiyayı.

Xwêdan, girtigeh, sîrgûn, tû-nebûn û tenebûn bû para te.

Lê te tu carî dev ji evîna xwe, dostaniya gelê xwe, zimanhezî û aştixweziya xwe berneda.

Dosto, Hevalo!

Hinekan jê re digot zimanê te tune ye, nasnama te tune ye.

Lê wî ji weki Cegerxwin digot: Na! Heye û ji şekirê Şamê ji şérântir e.

Jê re digotin zimanê te têra ni-vîsandînê nakek, lê wî digot:

Na! Zimanê min heye, zimanekî qedim e, zimanekî dewlemend e.



Wî digot, çanda min heye, çandeke xurt û pirengî ye

Weki xaka Mezopotamyaya qedim....

Lê ne tenê bi gotinê, wî ro-manên mezin afirand û nişanî he-mû cihanê da.

Weki Ehmedê Xanî wî ji digot ku;

'Da xelk nebejin ko Ekrad  
Bê marifet in be esl û binyad  
Enwaî millet xudan kitêb in  
Kurmanc tenê di bêheseb in'

Wî ji weki Xanî dixwest ku ala zimanê kurdi daliqine li banê ger-dûn...

Mihemedo, Hevalo! Dostê gelê xwe!

Tu di tenetiya xwe de, bi çem û kanî, teyr û tilür û çiyayên welatê xwe re axifi.

Te di vê tenetiya xwe de li Hawara Dicleyê guhdañî kir, tu geh li ber dengê dengbêjekî coşiyayı, geh ji te şîna Mirina Kaleki Rind ê welatê xwe kir...

Di taritiya sîrgûnê ya bi rengê mirinê de, tu li rohniya evînê geri-yayı,

Carnan dakte Bîra Qederê, li wê derê tu bûyi mîvanê Mîr Celadet, we bi hev re derd û elem û ke-deren xwe parve kir, te mîzgîniya xêrê da Celadet û te jê re behsa serkeftina şagirtên Hawarê kir, ü carnân ji te jê re Destana Egideki xwend.

Dostno! Hevalno!

Kekê Mihemed pir xebitî, pir zehmet kişand û pir ji afirand...

Lê sîrgûn û tenetiye û hesretê ew betiland (westand)...

Di şevêñ sar ên sîrgûnê de, we-kî mûmekê heliya.

Ji bo şîfayê li axa xwe, li gelê xwe vege riya û bû mevanê amediyan.

Hezar car mala we áva gelê min!

Bi hezkirina we, bi piştgiriya we iro kekê Mihemed weki evînê bû ronahî.

Lî hêleke wî Pira Deh Deni li hêleke din Çemê Dicle, li hêleki wî Bircen Amedê...

Tim û daîm rûmeten me Wedat Aydin, Musa Anter û Orhan Dogan li benda te ne

Wê te hembez bikin.

Çemê Dicle wê bibe elçî (qasid) di navbera we û Mem û Zinê de.

Ey seydayê min ên bi rûmet!

Dia bikin! Dia bikin. Em he-valê xwe bi rê dikin.

Ya Xwedayê şev û rojan!

Ya Yezdanê Dilovan! Tu cihê wî li bîhuşa xwe çêke.

Em jê razî bûn. Tu ji jê razî be!

Ey xorten ciwan!

İro Mehmed Uzun mevanê we ye; mevanekî pak revan e.

Wî li ser milen xwe hildin û li pénûsa wî xwedî derbikevin.

Bibejîn em sed hezar Mehmed Uzun li vir in.

Weki Dicle di kuçeyen Amedê de diherikin.

Ey nivîskarên xort!

Ew ala ku Mehmed Uzun ji Eli Herîri, ji Ehmedê Xanî, Cegerxwin, Hejar, Hêmin, Celadet, Osman Sebrî, Erebê Şemo, Rehîmê Qazî û Yaşar Kemal stendibû niha di destê we de ye.

Mesuliyet û barê we geleki gi-ran e.

Seydayê min! Dost û hevalen min!

Gelê bi min ê rûmet! Rabin! Me xemla mevanê xwe bi gulên rengereng girêdaye.

Em ê wî ji vê jiyanê bişînin ji-yanekî din.

Hemû kevokên bajarê min! Hêz bidin xwe. Rêz bigirin.

Basken xwe vekin û li bayê te-nik xin, Bifirin!

Kevokek nû cil i spî tev li we-dibe.

Rabin! Em ê wî bi rê bikin.

Em giş bi hev re bibejîn oxira te oxira xerê be, heval û birayê eziz.

Oxira te oxira xerê be!

Em giş lava bikin ji Xwedayê bi şev û roj, bila cihê wî ceneta baqî be!

Em qet te ji bir nakin!